Êkemîn Cengê Navdewletî li dijî Tîrorê
(hokar, destkeft, encam)

Sîpan Ebdulla

Piştî rûdanên 11-ê sîptemberê û ew karesata mezin ya tûşî Emrîka bûyî, kargîriya Emrîkî bi serkêşiya Corc Deblî Buşî heweka berfireh bo nehêlana tîrorê li seranserî cîhanê ragehand û şerê xwe li dijî tîrorê dest pê kir. Ji pêxemet kêmkirin, lawazkirin, jinavbirina bingeh û serbazgehên rêkxisitiya Elqayde. Şerê li ser hikumeta Talîban û rijêma Beis li Îraqê destpêka vî şerî bûn yan jî bi rêkên dîplomasî wek organîzekirina kongirên aştiyê yên taybet ewên rexnê li tîrorê digirin û berhingariya wê dikin û girove li ser vê çendê wîlayetên Yekgirtî yên Emrîkî çendîn pilan û piroje hene ji bo jinavbirina tîrorê û ji wanan:

* Jinavbirina rijêmên diktatorî li cîhana siyê ku ya xûyaye ku diktatoriyet yeke ji egerên serekî bo handana xelkê sivîl, bo tîrorê û her wesa Koşka Spî divê dîmokrasiyetê li van welatan biçespîne.

* Vekirina çendîn kongirên aştiyê û danûstandinê di navbera welatên îslamî û welatên dî li cîhanê da ku yek bigirin bo jinavbirina tîrorê û nemaze tîrora bi navê ayînî.

* Peydakirina astengan di rêka gehiştina çekî da bo rêkxiraw û bizavên tîrorstî ew jî bi rêka çavdêriyê li ser kompanyêt firotina çekî tirsandina welatên piştevaniya tîrorê dikin eve jî bi rêka gefan li ser van welatan bo nimûne jî gefên Emrîkî li ser Suryê bo girtina sinorê xwe ji bo rêgirtinê li derbazbûna tîrorîstan bo Îraqê.

*Gihurîna programên xwandinê li çendîn welatên erebî û îslamî.

Eve û zêdebarî çendîn pilanên din yên leşkerî û dîplomasî bo rûbirûbûna tîrorê û ya giring li vê derê em vê pirsyarê bikin. Erê hewa Emrîkî li dijî tîrorê ta çi rade şiyaye tîrorê kêm bike û çi destkeft bi dest ve anîne? Di vê pirsê de divê bizanîn ku Emrîka hemû şiyanên xwe terxan kirine bo jinavbirina tîrorê. Lê çi pênevêt ku şerekê bi vî rengî ku yekemîn şerê çerxiye li dijî tîrorê bi sanahî nabe ku em dizanin niho tîror berfireh bûye û kes nikare çarçovekê bo bidane û çendîn rêkxirawên tîrorîstî li seranserî cîhanê dirust bûyine. Belê sereray vê, hemû hêzên Emrîkî li gel hevpeymanên xwe şiyayne

serkeftinên mezin bi dest ve bihînin, mîna êxistina rijêma Talîban li Afganistanê û Beis li Îraqê. Belê her çawa be Emrîka hemû armancên xwe bi dest ve neanîne. Çunke divê bizanin ku tîror berdewame û ta nuke li Îraqê wek nimûne bi dehan karên tîrorîstî bi rojane dihêne encamdan û wekî rojinamevanê Emrîkî Robirt Kayzir bo diçe li rojnama "Waşînton Post" ku Îraq niho bûye Viyetnameka din.

Îro bi dehan rêkxistinên tîrorîstî diyar bûne. Raste Emrîka bi şêweyekê an bi şêweyekê din şiyaye rihên dîmokrasiyetê biçespîne li Îraqê û Afganistanê lê hêşta çendîn armancên Emrîka mayne hilawîstî li deverê . Cihê daxêye pêkolên Emrîkî bo jinavbirina tîrorê sernegirtîne û berhemê wê yekê nebûne ku tîrorê nehêle belku neşiyaye ta evro pênaseka yekgirtî jî bo tîrorê bidane û neşiyaye serkirdên tîrorîst mîna Bin Ladinî û Zewahîrî desteser bike -her çende di hewekê da şiyayne Zerqawî bikujin li xizîrana 2006-ê ku serkêşê Qayde bû li Îraqê-. Ev car Emrîka pêdivî bi hêşta xebatê û qurbaniya ye da bigehîte cem armancên xwe. Bi dîtina min xala serekiya bûye egerê destpêkirina şerê dijî tîrorê rûdanên 11-ê siptemberê bûn ku li gel borîna şeş salan ji vê karesatê û ev rûdana mezin ewa li seranserî cîhanê deng vedayî û bûye bûyerek ku Emrîka bikêşe berev yekemîn şerê çerxî li dijî tîrorê û şerê li ser rijêma Talîban destpêka vî şerî bû. Stratijiyeta şerî ewa kargîriya Emrîkî ragehandî kariye êmnahiya navxweyî ya Emrîka biparêze di demekê de pêşbînî hebûn hêrişên ji vî curê berdewam bin. Ew gihorînên rûdayin piştî van rûdana çi li ser astê leşkerî yan dîplomasî pitiriya wan girêdayî Rojhelata Naverast bûn. Emrîka dest pê kir bi pêşkêşkirina pirojên cuda cuda di vî arasteyî de wek:

- Destpêşxeriya hevpişkiyê li salla 2002-ê.
- Pirojê Rojhelata Navîna mezin li sala 2004-ê.

Ev piroje hemû ji pêxemet dîmokrasîkirina deverê û kêmkirina tîrorê hatine dariştin. Wîlayetên Yekgirtî yên Emrîkî şerekê hizirî yê mezin li deverê dike wek Kolin Pawil wezîrê derve yê Emrîkayê berê gotî: "*şerê me li ser tîrorê ne bi tinê şerekê leşkeriye belku şerekê hizirî û rewşenbîriye jî û me divê rewşenbîriya îslamê ji nû ve ava bikin*". Bi dîtina min Emrîka wî demî şerî dike demê neçar dibe û çi rêk li ber nemînin, û li Îraqê jî dibe Emrîka neviyaba şer rûdaba çunke heger wê şer viyaba, pirsiyarek xwe dianî pêş: "Ji bo çi Emrîka ji berî şerî mawê 48 demjimêra wek mulet da Sedamî û herdû kurên wî ku Îraqê bi cih bihêlin? Ya ji min ve, eve bo hindê bû da ku şer çênebe.

Destkeftên Emrîka di şerî da:

Vegeriyan bo wê sînaryoya li Emrîka rûdayî li 11-ê siptembera

2001-ê, li pey hizirên min ev kesên bi van rûdana rabûyin mezintirîn xizmet ya li Emrîka kirî û birêka hindê Emrîka çendîn destkefit bidest ve înayne wekî:

Van rûdana biyav li ber Emrîka xweş kir ku hêrişê bike ser Afganistanê û Îraqê û dagîr bike û armancên xwe bi cih bihîne û hebûna xwe ya leşkerî li deverê mikum kir.

Cîhana rojava piştî van rûdana piştgîriya Emrîka kir dijî tîrorê û rijêmên diktatorî û gelek ji welatên rojava bûne hevpeymanên Emrîka bi taybetî di şerê li ser Îraqê de, her çende hindekan xwe vekêşan piştî barê navxweyî yê Îraqê aloz bûyî û pêşbîniyên şerekê tayfegerî xwe dihîne pêş û Îspanya û Silvador dû mînakên aşkirane bo vê axiftinê.

Bi vê çendê Emrîka bawerî li cem civakê navdewletî peyda kir ku şaristaniyeta rojhelatî ji bilî xwînrîştinê û tîrorê û zordariyê çi tiştên din nînin. Çunke her çawa be evên bi van rûdanan rabûyin ji xelkê rojhelatî bûn û bi vê çendê dê civakê navdewletî pesenda şaristaniyeta Emrîkî ya yek cemserî ket dijî şaristaniyeta rojhelat.

Emrîka Bi rêka vê çendê û piştî êxistina rijêmên Kabul û Bexda û hatina bo vê devera dewlemend bi samanên avê, gazê û samanên siruştî şiya destên xwe dane ser van samanên giring. Her çende nahê veşartin ku kertê aborî yê Emrîka yê bi hêze lê ew wekî me hizir nakin (belku ew hizra piştî 50-î salan diken ji nûke.)

Her çawa be van rûdana ziyanên giyanî û aborî yên mezin li Emrîka kirin û her wesa heybeta wê ya leşkerî û navûdengên wê li kîmyadan, belê ev kesên bi van rûdanan rabûyine negehiştine armancên xwe. Her çende Maykil Şwîr ku berpirsekê "CIA" bû pêşbînî dike, hêrişên mezintir jî rû bidin li Emrîka û ne ku li Ewropa.

Dehmen:

*Tîror û xandineka nû bo rûdanên 11-î sptemberê / cume bendîÇapa yekêDuhok

*Kurd û pirujê rujihelata naverasta mezin / bişar kîkîDuhok 2004

*Stiratîjî ye Buş alcedîde ma hî ala hîle tiktîkî ye / miqaleFîktur lîtufkîn.

*Hiwar mi Maykil Şwîr mesul al CIA / mintdî biwabe AlirbTircme Mihmid Alsîd

*Alimsolî ye Alirbî ye n alsiyase alamirîkî ye alşiriq awisgîye / miqale biqilim Macid KiyalîMîdil ayst awin layin

*Kiwarip alulayat Alimthde fî Aliraq / Robirt KayzirWaşngtin Post